

## Jina Kurd û Pênaseya Nû

**Têkoşîna jinan ji bo bidestxistina mafên xwe ne cuda ye**

Di têkoşîna neteweya me ji bo demokrasî û azadiyê de şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlo dibêje:Neteweperwerî wek prensîbeke siyasî di avakirina dewletê de roleke diyarker û bihêz dilîse û di rastivê de erkê neteweperweriyê bi xwe......

Dom»R:6





*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (494)21-05-2025Buha (1000) Tûmen*




## Ji Çiyayan Ber bi Dîplomasiyê – Destpêka Qonaxeke Nû di Dîroka Neteweya Kurd de

Di bihara 2025an de, Rojhilata Navîn şahidiya yek ji girîngtirîn pêşketinên jeopolîtîk ên dehsalên dawî kir: hilweşandina fermî ya Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) di Kongreya wê ya 12emîn de, piştî banga dawî ya Abdullah Öcalan a devjêberdana têkoşîna çekdarî. Ev bûyera dîrokî li hevberdana çend meylên herêmî û navneteweyî yên hevdem û demdirêj qewimî...

Dom» R:4



## Seredana Trump bo Rojhilata Navîn, Hêla nîqaşên guhertina di Herêmî û Îranê de

Donald Trump, Serkomarê niha yê Amerîkayê, di demek hestiyar de seredekî girîng bo Rojhilata Navîn kir ku tê de hevdîtinên bi serokên serekeyî hatine lidarxistin, wekî Ehmed Şer`i, serokê dewleta demkî ya Sûriyê, Mihemed bin Selman, padşahê Erebistanê, û jî seredana wî bo Oman. Ev seredan di nav guhertinên herêmî yên girseyî de hat kirin, di nav wan de ji holê rakirina girûpên girêdayî bi rêjîma Îranê.......

Dom» R:6

# Netewên serdest naxwazin hêz û deshilata wan kêm bibe



Dema ku hêz û deshilata Siyasî, Abûrî, Leşkerî, Çandî, Cografiyayî, û ..... bi sedemên cuda li dîroka derbasbûyî de li bin destê aliyek yan girûpek yan netewe û itnîkekê de kom bûne, û gelek cudatî û netewên wek wan jî hene ku bûne bindest û mihtacê wan baladestan û li serve wekî bindest, reiyet, derece 2 û kêmanî têne mêzekirin, em dibînin ku tu caran dana aliyê kême wan deshilat û mafan bi wan aliyên jêr dest û bê maf, bi rewa nayête zanîn.

Li welatên nawça Rojhilata Navîn de û bi taybetî li wan welatan de ku Kurd û Kurdistan bi ser wan de hatiye parvekirin, li pêkhata deshilata wan welatan de ku Kurd wek kevnartirîn civatgeha ser milk û erdê xwe bi navê Kurdistan dijî, weke neteweyekî bê maf her li jêr destiyê de ye û axa wê ji aliyê neteweyên xeyre ve hatiye dagîrkirin ku çi pêywendiyek bi Kurdistanê ve nîne.

Ev netew wek Ereb, Turk, û Fars tenê û tenê li ber evê ku hemî heyî û neyîya welat li warên siyasî, abûrî, çandî, leşkerî ve di destê wan de bimîne û ji hêz û deshilata wan kêm nebe, amade nînin ku kêmtirîn wan mafan bo Kurdan jî bi rewa bizanin. Çimku hekî deshilata xwe a siyasî yan abûrî û çandî digel Kurdan parvebikin, ji hêza wan kêm dibe.

Ev sedemên bingehînin ku dagîrkerên Kurdistanê şerê bêdengkirin û tunekirin û jêrdestiyê de ragirtina Kurdan dikin.





## Sosyalîzma demokratîk û Sîmaya demokratîk di felsefeya siyasî ya Qasimlo de

Dom » R:2



## Aliyên veşartî yên derencamên kolberiyê li Kurdistanê-gengeşeyeke kurt a hundirnasiyê

Dom » R:3

# Sosyalîzma demokratîk û Sîmaya demokratîk di felsefeya siyasî ya Qasimlo de



**N. Elî Munezemî**

Li wan demên bihorî de, reftar û helwêstên hindek li endamên PDKÎ di ser torên civakî, gelik li sîyaset û armancên wê partiyê dûr ketine û heta niha rêberiya wê partiyê bi deyan caran dawa li endamên xwe kiriye ku li çarçoweya sîyasî-exlaqî a wê partiyê dûr nekevin, lê ew yek li aliyê hindek kesan we nayê bihîstin û bûye sedemê pêkhatina pirsgirêkan bo rêxistin û rêberiya wê hizbê.

Qasimlo dibêje: ” Xurtkirina yekîtiya hizrî û siyasî di partiyê de karekî bingehîn e ku li ser milê hemû rêxistinên partiyê ye. Eşkere ye ku ne hemû endamên partiyê di mijarên siyasî de wek hev difikirin, û ne jî armac ew e ku lihevkirinek tevahî çêbibe - ev ne realîst e û ne jî di berjewendiya partiyê de ye.

Armanca yekîneyeke wisa ne jî ew e ku afirîneriya rewşenbîrî ya endaman an azadiya ramana serbixwe sînordar bike.

Bi berevajî, hebûna nêrînên cuda û çareserkirina pirsgirêkan bi awayekî demokratîk û pirrengiya ramanan, şertek pêşîn e ji bo dîtina çareseriyên baş û ji bo pêşketina partiyê.

Lêbelê, endamekî Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) divê bi awayekî pabendî xeta siyasî û îdeolojîk a partiyê be ku bi awayekî zelal ji endam û alîgirên partiyên din cuda bike.

Mirov nikare bibe endamê KDPI û di heman demê de ji hêla fikrî ve xwe bi nêrînên bingehîn ên partiyek din ve girêbide.”

Ramanên siyasî yên Dr. Abdulrehman Qasimlo li ser pabendbûnek eşkere ya bi sîmaya demokrat û sosyalîzma demokratîk re koka xwe dikute - rêbazek îdeolojîk ku hewl dide edaleta civakî bi azadiyên takekesî û pirrengiya siyasî re li hev bîne.



Berevajî modelên sosyalîst ên otorîter, ku wî rexne li wan digirt ji ber ku wan cureyek zilmê bi cureyek din diguherand, Qasimlo sosyalîzmê wekî amûrek ji bo pêşvebirina azadiya netewî didît, ne ji bo sînordarkirina wê. Ji bo wî, sosyalîzm diviyabû xizmetkarê demokrasiyê be, ne dijminê wê.

Ew li ser wê baverê bû ku em ne ji bo sosyalîzmeke dîktatorî şer dikin ku zilmkarekî bi yekî din biguhere, lê ji bo sosyalîzmeke ku di xizmeta azadiyê de be.

**Ji bo Qasimlo, sosyalîzma demokratîk daxwazek bêcêgir ji bo desthilatdariya netewî, serweriya hiqûqê û civaka sivîl nîşan dida, di heman demê de armanca wê ew bû ku li dijî newekheviya aborî û marjînalîzekirina civakî şer bike.**

Wî modelên Marksîst-Lenînîst red kirin ku rêz li azadiya derbirînê, muxalefeta siyasî û serdestiya hiqûqê nagirin. Di heman demê de, wî rexne li kapîtalîzma lîberal girt ji ber ku neheqiya civakî û xerîbbûnê çêdike.

Çareserî di sosyalîzmeke populer, piralî û ne-dogmatîk de didît. Liber hindê jî ew di wê baverîyê de bû ku Sosyalîzma em bawer dikin, ne ew e ku bi rêya dîktatorî û zordariyê li ser gel tê ferzkirin, lê ew e ku girêdayî daxwazên gel e û bi beşdariya gel mezin dibe û vedigeşe.

Di berdewamiya vê de, Dr. Qasimlo herwisa li ser girîngiya zêhniyeteke demokratîk tekez kir - ango, zêhniyet û çandeke siyasî ku pirrengiyê bi pêdivî dizane, toleransê pêş dixe û rêzê li dengên nerazî digire.

Ji bo Qasimlo, demokrasî ne tenê şêweyekî hikûmetê bû, lê komek li helwêst û norman bû: şiyana guhdarîkirinê, amadebûna ji bo alternatîfan, û têgihîştina ku desthilatdariya takekesî û monopol li ser rastiyê tune dike.

Ev yek bi taybetî di tekezîkirina wî ya li ser hevkariya sîyasî a bi aliyên din yên sîyasî re, rêzgirtina ji bo mafên jinan, û piştgiriya wî ya eşkere ji bo mafê diyarkirina çarenûsa neteweyên blindest û kêmneteweyan de diyar bû.

**Bo Qasimlo demokrasî ne tenê wekî armanc bû. Wî dixwast ku em wê di pratîka xwe, partiyên xwe û tevgera xwe de bi kar bînin û ew yek li helsûkewt û pratîka me de şewqa xwe wede.**

Ji bo avakirina çandeke demokratîk a wiha, wî israr û pêdagirî dikir ku divê PDKI û tevgera Kurd wekî alternatîfek ji bo hem zordariya teokratîk û hem jî otorîterîzma sekuler derkevin holê.

Ew di wê baverê de bû ku PDKÎ ne tenê divê li dijî rejîma Îranê şer bike, lê di heman demê de bi pratîka xwe jî nîşan bide ka civakek bi rastî demokratîk dikare çawa be.

Yanî ewî dixwest ku em ji bo civaka ku em dixwazin biafirînin bibin modelek. Reftarên me, biryarên me, awayê ku em bi hev re û li ser hev diaxivin - divê ev hemû bi demokrasiyê werin taybetmend kirin û xemilandin.

Bi wî awayî, wî rêbaza îdeolojîk û pratîka exlaqî bi hev ve girêda.

Tevgereke sosyalîst a demokratîk a rastîn ne tenê ji bo çêkirina civakek dadperwer şer dike, lê di heman demê de di rêxistin, retorîk û stratejiya xwe de jî prensîbên demokratîk ber çaw digre.

Bi vî awayî, ramana Qasimlo dikare wekî sentêzek normativ a azadî, edalet û rêzgirtinê were fêmkirin, ku tê de hişmendiya demokratîk garantiya wê yekê ye ku sosyalîzm dê nebe zordestî, û sosyalîzm di heman demê de naverokek civakî dide demokrasiyê.

# Aliyên veşartî yên derencamên kolberiyê li Kurdistanê-gengeşeyeke kurt a hundirnasiyê



N. Bêhgzad Qadirî
W. Bêhzad Simko




Kolberî, anku hilgirtina barek giran bi pişt û ser milan û derbaskirina vê li rêyên dijwar ên bilindahiyên çiya bo hawirdekirina alavan, ji aliyê din ê sînorê destçêkirî yê Rojhilatê Kurdistanê ye. Li parêzgehên Rojhilatê Kurdistanê de gelek caran ew kar ji aliyê, mêr, ciwan û hinek caran jî ji aliyê jinan ve jî tê kirin. Dijwariya rewşa karkirin, metirsiya mirin, teqekirin ji aliyê çekdarên rêjîma Îranê, sir û seqem û necihgîrbûna aborî, ew mijar in ku kolber tûşî wan dibin. Li vê dawiyê de li 22ê Banemera îsal, Kolberekî ciwan ê xelkê Merîwanê ku xwediyê çendîn xelatên curbicurên werzişî bû, ji aliyê çekdarên rêjîmê ve li ser sînor, teqe lê hate kirin û hate kuştin.

kolberî li Kurdistanê diyardeyeke koloniyalstî, civakî û aborî ye ku ji du sê dehikên derbasbûyî ve li Rojhilatê Kurdistanê, bûye pirsgirêkek mezin. Ev diyardeya netenê her paşhatên aborî û civakî yên berfirej hene, belku karlêkerîiyeke kûr û demdirêj li ser hundirê kolberan bi cih dihêle ku heta niha, gelek bi kêmî bas ji vê hatiye kirin.

Kolberî wek karek aborî ku li encama hejarî, bêkarî, nebûna derfeta kar û siyaseta dujminkarane ya dewleta dagîrkera Îranî li Kurdistanê serî hildaye, paşhatên hundirî yên berfireh bo kolberan heye. Kolberî dibe sedema panîk an dilequtkêyekî demdirêj, xemokî, strêsa piştî karesat û nehiştina bawerî bixwe(PTSD) û têkçona pêywendiyên malbatî û civakî.

**Bo lêkolîn li ser vê diyardeyê li warê hundirnasiyê ve, hewce ye ku ji wan teoriyan mifah bê vergirtin:**

- Teoriya (Social VulnerabilityTheory); anku lawazbûn li hember derb û xisarên civakî, ew teoriya bas ji vê yekê dike ku ew kesên rastî hejarî, nedadperwerî û kêmiya çavkaniyan dibin, zêdetir ji kesên din tûşî xisaran dibin û zêdetoir jî tûşî nexweşiyên hundirî dibin.

- teoriya (Stress Theory) anku givaşa hundirî an strês; Pêka vê teoriyê, rûberûbûna demdirêj digel givaşên tund û dijwar ên jîngeha jiyanê dibe sedema têkçon û alozbûna hundirî yên wek xemokî, dilequtk û nearamiya hundirî.

- Pêka wan 2 teoriyane û bi hûrbûn li rewşa kolberî û kolberan li Kurdistanê(pêka raportên mafên mirovî), em digihine bi vê encamê:

- Kolber berdewam rastî metirsiya mirin an birîndarbûnê dibin. Ev sehkirina berdewam bi gefxwarin û diltirsînê, dikare bibe sedema têkçona hundiriya micid wek (li destpêka "PTSD"yê de zêdebûna dilequtka demdirêj û strêsa piştî karesata PTSD, ku li serwetir min îçare pê kir).

- Xemokî û sehkirina bênirxbûnê: piraniya kolberan ji destê curek bêhivîtiya demdirêj, dinalin, ew karê xwe bi bênirx, bê paşeroj û zelûlker mêze dikin, ew jî dibe sedema xemokiya dijwar anku "Schizophrenia".

- Kêmbûna seha bawerîbixwebûn û wênekirina nerênî ji xwe: sehkirin bi avêtin ji civakê, lêmêzekirina nerêniya civakî û nebûna piştevaniya hikûmî, dibe sedema vê ku kolber she bi bênirxbûna xwe bike û seha bawerîbixwebûnê kêm dibe.

- Têkçon û alozbûna pêywendiya malbatî û civakî: di malê de nemana demdirêj a kolberan, givaşa hundirî û fîzîkî û kirîza darayî, dibe sedema dijheviya li nav malê, jihevcudabûn û sariya li navbera pêywendiyên xweşvanî û sozdarî a wan.

- Sehkirin bi guhnedan û piştguhavêtina wan û nedadperweriya civakî: kolber seh dikin ku hikûmet û civakê, ew piştguh avêtine û bi ti şêwazekê nirx û şan û pêgehek bo jiyana wan nadanên. Ew sehkirina dibe sedema nerizayetiya kûr a civakî û destpêkirina reftara xwedûrgirtin û tenêmanê.

**Encam**

Kolberî li sînorên destçêkirî yên li Kurdistanê, bi sedema nebûna derfeta karê berdewam, bûye yek ji bijardeyên dahata xelkê. Dwleta dagîrker a Îranî, bi awayekî sîstematîk, bi rêgirîkirin ji berhemanînan li Kurdistanê, hewlê dide ku vê rewşê bidomîne û xelkê Kurdistanê li asteke hejarî, necihgirbûn û girêdayî bi sînorên destçêkirî de bihêle. Lewma, kolberî li Kurdistanê siyasetek koloniyalîstî û dujminkarane a rêjîma Îranê ye û ti paşhatek kolberiyê jî nayêne çareserkirin, meger dawî bi koloniyalîsma li Kurdistanê bê anîn.



# Ji Çiyayan Ber bi Dîplomasiyê – Destpêka Qonaxeke Nû di Dîroka Neteweya Kurd de



**N. Dr. Mecîd Heqî**

**Beşa 1**

Di bihara 2025an de, Rojhilata Navîn şahidiya yek ji giringtirîn pêşketinên jeopolîtîk ên dehsalên dawî kir: hilweşandina fermî ya Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) di Kongreya wê ya 12emîn de, piştî banga dawî ya Abdullah Öcalan a devjêberdana têkoşîna çekdarî. Ev bûyera dîrokî li hevberdana çend meylên herêmî û navneteweyî yên hevdem û demdirêj qewimî: guhertinên kûr di avahiya rêziknameya Rojhilata Navîn de piştî qelsbûna mîhwera Îran-Sûriyê, destpêka pêvajoya aştiyê li Sûriyeyê û hilweşîna rejîma Baas, nemaze piştî hilweşîna dawî ya rejîma Esed, û her weha nêzîkbûna zêde ya berjewendiyên Rojavayî bi xwestekên demokratîk û neteweyî yên gelê Kurd re.

Pirsgirêka Kurd li ber veguherînek dîrokî ye; Ji "pirsgirêkek navxweyî" ya welatên ku Kurdistanê dagir dikin (Îran, Tirkiye, Iraq û Sûriye) ber bi dozek herêmî û navneteweyî ya bi aliyên pir-qatî yên qanûnî, ewlehî, aborî û demokratîk. Di vî warî de, hilweşîna gav bi gav a otorîterîzmê li Tirkiyeyê, zexta zêde ya Yekîtiya Ewropayê li ser hikûmeta Erdogan di derbarê mafên kêmneteweyan de, û krîza aborî ya kronîk û nazik ku di siya polîtîkayên şer ên çil salan ên li dijî Kurdan de pêşketiye, şert û mercên ji bo ji nû ve pênasekirina stratejîk a pirsgirêka Kurd afirandine.

PKK, ku di sala 1978an de ji aliyê Abdullah Ocalan û komek xwendekarên çepgir ve li Enqerê hate damezrandin, li hember înkara sîstematîk a nasnameya Kurd li Komara Tirkiyeyê, ji bo bidestxistina mafên neteweyî yên Kurd têkoşîneke giştî da destpêkirin. Ji destpêkê ve, girêdana di navbera têkoşîna neteweyî û analîza çînî de di bingehên rewşenbîrî yên vê partiyê de dihat dîtin; Tiştek ku di serdemên paşîn de ji Marksîzma ortodoks wêdetir çû û bû sedema teoriyên nû yên wekî "konfederalîzma demokratîk".

Destpêka têkoşîna çekdarî ya PKKê di sala 1984an de ne tenê bertekek li dijî tundûtûjiya avahîsazî û înkara sîstematîk a nasnameya Kurd ji aliyê hikûmeta Tirkiyeyê ve bû, lê belê pêdiviyek dîrokî bû ji bo domandina fizîkî, çandî û siyasî ya gelê Kurd li bakurê Kurdistanê. Ev têkoşîn ji valahiya giran a temsîlê, astengiya siyasî û tepeserkirina zimanî, olî û civakî derket holê ku bi dehan salan neteweya Kurd di tecrîda siyasî de hiştibû.

Di salên piştre de, PKK di afirandina toreke pirqatî û hevgirtî ya rêxistin, sazî û avahiyên parastinî, çandî, siyasî û civakî de li erdnîgariya Kurdistanê û her weha di nav dîasporaya xwe ya pirjimar a li Ewropayê de karî toreke pirqatî û hevgirtî ya rêxistin, sazî û avahiyên parastinî, çandî, siyasî û civakî biafirîne. Ev tor ji saziyên xwerêveberiyê, meclîsên gel, sendîkayên xwendekaran û jinan, medyaya Kurdî û şaxên parastinê yên herêmî pêk dihat ku dikarîbûn li hember polîtîkayên asîmîlasyon û tinekirinê li ber xwe bidin.

Di salên 1990î de, vê tevgerê, bi navbeynkariya kesayetiyên wekî Celal Talabanî, serokê rehmetî yê Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê û Serokkomarê berê yê Iraqê, gelek caran amadebûna xwe ya ji bo destpêkirina rêya diyaloga siyasî û dîtina çareseriyek aştiyane ji bo pirsgirêka Kurd li Tirkiyeyê diyar kir. Lêbelê, li şûna ku li derfeta lihevhatinê sûd werbigirin, hikûmetên Tirkiyê yên wê demê zext, leşkerîkirin û înkarkirina nasnameyê zêde kirin û bi vebijarka tundûtûjiya siyasî ve girêdayî man.

Revandina Abdullah Öcalan di 15ê Sibata 1999an de, di operasyoneke navneteweyî de, xaleke werçerxê bû di dîroka tevgerê de. Ji dema ku li Girava Îmraliyê girtî bû ve, wî stratejiyên xwe yên berê ji nû ve sererast kir û projeya "çareseriya demokratîk" wekî alternatîfek ji bo têkoşîna leşkerî pêşkêş kir. Teoriyên wî yên li ser konfederalîzma demokratîk, encumenên herêmî, jîngehparêzî, rêveberiya xweser û rizgariya jinan bingehên nû ji bo gotara PKKê afirandin, ku hêdî hêdî ji formata partiya kevneşopî derbas bû û bû felsefeyek ji bo rêxistina civakî.

Di salên 2010an de, ev gotar bi awayekî berbiçav di ezmûna xwerêveberiya demokratîk a Rojava de xwe nîşan da; Modelek ku ne tenê ji bo Sûriyeyê, lê di heman demê de ji bo gelek tevgerên civakî li Rojhilata Navîn, nemaze di warên jin, ciwan, kêmnetewe û jîngehê de îlham da.



Bi vî awayî, PKK karibû têkoşîna xwe ji asteke tenê leşkerî bigihîne asteke gotûbêjî û civakî, û ji bo têkoşîna rizgariyê ya gelên herêmê asoyên nû veke.

Di sala 2025an de, banga nû ya Ocalan ji Girtîgeha Îmraliyê ji bo bidawîanîna têkoşîna çekdarî li ser heman prensîbên demokratîk û bi taybetî di çarçoveya vebûna muhtemel a qada siyasî ya Tirkiyeyê de hat kirin. Bi vî awayî, bi qebûlkirina vê bangê di Gulana 2025an de, PKK ket qonaxa hilweşandina fermî, û di dîroka tevgera Kurd de serdemeke nû dest pê kir.

Bi destpêka dehsalîya sêyem a sedsala 21an re, Rojhilata Navîn ket qonaxeke nû ya ji nû ve rêzkirina jeopolîtîk; Pêvajoyek ku di encama pêşketinên navxweyî, hilweşîna hikûmetên otorîter, reqabetên jeojenîk ên di navbera hêzên herêmî de, û ji nû ve pênasekirina berjewendiyên Rojavayî li herêmê de, hevsengiya hêzê guherand. Yek ji encamên herî girîng ên van pêşketinan ew bû ku pirsgirêka Kurd ji pirsgirêkek "navxweyî" ya welatên ku Kurdistanê dagir kirine, veguherî pirsgirêkek "herêmî-navneteweyî".

Yek ji xalên werçerxê yên herî berbiçav di veguherîna dîrokî ya pirsgirêka Kurd de, qelsbûna girîng a desthilatdariya rejîma Beşar Esed ji sala 2011an vir ve ye. Geşedanek ku, piştî zextên navxweyî yên ji ber serhildanên gel û zextên derveyî yên ji ber şer û cezayan, hikûmeta navendî ya Sûriyeyê ji beşên mezin ên erdnîgariya welêt dûr xist. Di valahiya desthilatdariyê ya derketî holê de, hêzên Kurdî yên girêdayî Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) û YPGê di damezrandina modelek nû ya rêveberiya herêmî û demokratîk de, ku ji teoriya konfederalîzma demokratîk a Abdullah Ocalan derketiye, bi ser ketin.

Berevajî fikar û analîzên destpêkê yên hêzên herêmî, ev ezmûn ne tenê nebû çavkaniya bêîstîqrariyê, lê di heman demê de ji hêla gelek saziyên Rojavayî ve wekî mînakek aramiyê, pirrengiya çandî û parastina gel a bi bandor hate nas kirin. Piştgiriya nefermî lê berdewam a Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Fransa, Almanya û Holandayê ji bo strukturên xwerêveber ên Rojava wekî nîşanek ji veguhestina pirsgirêka Kurd ji derdora erdnîgariyê ber bi navenda biryardana navneteweyî ve hate dîtin.

Di astek berfirehtir de, hilweşîna nisbî ya avahiya dewleta neteweyî li welatên wekî Iraq, Sûriye û Lubnanê, û heta hilweşîna otorîteyê li Îran û Tirkiyeyê, cih ji bo çalakvaniya hêzên ne-dewletî - bi taybetî hêzên neteweyî, olî û sivîl - vekir. Kurd, bi pişta xwe bi dîrokeke berxwedana berdewam a ji bo rizgarî û azadiyê, rêxistineke hevgirtî û toreke dîasporayê ya çalak, di vê çarçoveyê de karîn bibin yek ji lîstikvanên sereke yên Rojhilata Navîn a nû.

PKK, ku berê di lîsteya rêxistinên terorîst ên welatên rojavayî de bû, bi lîstina roleke rasterast di şerê li dijî DAIŞê de û parastina Êzidî û kêmneteweyên olî de, xwe wekî hêzeke aramiya herêmî damezrandiye. Ev guhertina perspektîfa gerdûnî, gotara Kurdî ji sînorê ewlehiyê ber bi navenda dîplomasiya navneteweyî û mafên mirovan ve bir. **Dom heye …….**

# Seredana Trump bo Rojhilata Navîn, Hêla nîqaşên guhertina di Herêmî û Îranê de



N. Hesen Mukerem



Donald Trump, Serkomarê niha yê Amerîkayê, di demek hestiyar de seredekî girîng bo Rojhilata Navîn kir ku tê de hevdîtinên bi serokên serekeyî hatine lidarxistin, wekî Ehmed Şer`i, serokê dewleta demkî ya Sûriyê, Mihemed bin Selman, padşahê Erebistanê, û jî seredana wî bo Oman.

Ev seredan di nav guhertinên herêmî yên girseyî de hat kirin, di nav wan de ji holê rakirina girûpên girêdayî bi rêjîma Îranê û berdewamiya krîzên li ser projeya navikî ya Komara Îslamî ya Îranê, û ev hemû bi encamên stratejîkî girîng re hatiye girêdan.

**Hevdîtinên serekeyî û Nûvekirina Xetên Hêzên Herêmî**

Civîna Trump bi Ehmed Şer`i, kesek ku wekî serkirdeyek bo çareseriyaa reforman an hembertiyê di hikûmeta Sûriyê de tê nasîn, nîşana guhertina dîtingeha Washingtonê li dijî rejîma Esed û daxistina wê ji xeta Tehran-Hizbullahê ye.

Di heman dema de, gotûbêja wî bi Mihemed bin Selman ser bi xurtkirina hevpeymaniya stratejîk a di navbera Amerîka û Erebistanê de hat lidarxistin, ku armanca wê şerê dijî hêz û nifûza Îranê li herêma ye.

Seredana Trump bo Oman jî girîngiya taybetî heye. Oman wekî navbeynçî şopîner di krîzên herêmî de, rolê girîng di asan kirina danûstandinên ne-rasterast a dinavbera Îran û Amerîka de dilîse.

Wekî xuya dike, Trump dixwaze bi destnîşankirina piştgiriya Mesqetê, rêya vegera Îranê bo maseya danûstandinan vekin; ev danûstandina ku, bûne pêwîstiyekê herî girîng bo aborî û siyaseta Îranê.

**Jibîrkirina Stratejîk a girûpên girêdayî bi Îranê di herêmê de**

Yek ji encamên herî zelal a guhertinên dawî, kipkirina dirêj a girûpên terorîstî yên Komara Îslamî ye.

Hûsiyên Yemenê piştî salan şerê dirêj, di bin operasyona leşkerî û aborî ya giran de ne. Hizbullah li Libnanê bi krîzeke aborî û têkoşînên gelî rûbirû ye û hebûna xwe ya nav gelê xwe ji dest da.

Hemas jî di Xezê de ku ji her ji ber wan jî şerên giran hatine meşandin û gelek serkideyên sereke yên wê rêxistinê di şerê Îsraîlê de hatine kuştin.

Bi rastî, Îran îro di rewşeke herî tenê û wergerî de ye, Girûpên terorîstî yên milîsên Îranê jî hatine ji navbirin, yan jî hebûna girîngiya xwe ji dest da.

Ev guhertina bingehîn di jeopolîtîka herêmî de maf û stratejiyên Tehranê girîng nîşan dide.

**Gelo Îran dê şertên danûstandinê qebûl bike?**

Pirsa sereke ev e: Gelo Îran di bin vê opresyona zêdeyê de vê hilbijêre ku berxwedanê bike, yan vegere ser maseya danûstandinê? ezmûnên berê nîşan didin ku Komara Îslamî di demên şikestê de, dema armanc û alîkarî ya herêmî û aborî kêm dibin, vedigere bo maseya diyalogê; her çend bi şer û qebûlkirina kêmbûna desthilatdariyê be jî.

Lê ji aliyê din, Amerîka dixwaze bigehe peymanekî nû û fireh ku tenê ne li derheq bernameya naovkî be, belku bernameya mûşekî û tevgerên Îranî yên li herêma jî tê de bibe.

Di vê rewşa niha de, Îran gava ku nikare piştgîriya xwe ya bi girûpên girêdayî bi xwe di herêmê de bidomîne, û krîzên aborî jî zêde bûne, dibe ku neçar bibe bi şêwazeke neçarî şertên Amerîkayê di danûstandinan de qebûl bike.

**Encam**

Seredana Trump bo Rojhilata Navîn û hevdîtinên wî bi serokên serekeyî yên Ereb, vê yekê nîşan dide ku Amerîka dixwaze siyaseta xwe ya herêmî bi awayeke radestkirî nûv bike.

Di heman demê de ku girûpên girêdayî bi rêjîma Îranê li deverê de her yek bi yek têne jinavbirin, Komara Îslamî bi krîza rewabû û sînûrdarkirinên neteweyî yên zêde re rûbirû ye.

Hemî nişan didin ku Îran li ber serdema biryarê ya dîrokî ye: berxwedan û jinavçûn an vegera bo ser maseya danûstandina bo domandina mana xwe.



# Jina Kurd û Pênaseya Nû



N .Mujigan Elîpûr
W .Hesen Mukerem




**Têkoşîna jinan ji bo bidestxistina mafên xwe ne cuda ye**
Di têkoşîna neteweya me ji bo demokrasî û azadiyê de şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlo dibêje:
Neteweperwerî wek prensîbeke siyasî di avakirina dewletê de roleke diyarker û bihêz dilîse û di rastiyê de erkê neteweperweriyê bi xwe ew e ku ji bo rizgarbûnê ji bindestiyê û bidestxistina serxwebûnê têbikoşe.

Neteweya Kurd di vî warî de têkoşîneke dirêj û bênavber heye û xwedî dîrokeke serbilind a rûbirûbûna bi hikûmetên dagirker re ye. Her çend neteweperweriya Kurdî demek dirêj berî damezrandina Komara Kurdistanê derketiye holê û damezrandina hikûmeta Kurdî berdewamiya şoreşên berê bû jî.

Lêbelê, Komara Kurdistanê weke destpêka neteweperweriya Kurd a modern tê hesibandin, ku destkeftî û bandorên wê wisa kirine ku ala rizgarî û serweriyê hîn jî li Rojhilatê Kurdistanê bilind e.
Neteweperweriya Kurd, tevî hewildan û destkeftiyên xwe di qonaxên cûda de û têkoşîna xwe ya kûr bi dîktator re, her tim ji ber ku weke têkoşînek mêranî tê dîtin, hatiye rexnekirin.
Vê yekê kêmtir kariye jinan li dora xwe bicivîne, ku ev hinekî guncaw e, lê ji bo nirxandina vê pirsgirêkê çiqas û çawa, divê em li gorî dem û qonaxa têkoşînê bixwînin da ku em bikaribin nirxandinek rastîn bidin.
Li Kurdistanê di bin desthilatdariya dîktatoran de, hem di dema monarşiyê de û hem jî li dema Komara Îslamî de, tekoşîna Kurd qet nebûye qadeke vekirî û azad ji bo pêşxistina neteweperweriyê û berevajî vê her tim hatiye tepeserkirin.
Neteweperestiya faşîst a Îranî bi hemû hêza xwe rê li ber vê têgehê girtiye û hewl daye ku ramana neteweperest, ku neteweperestiya Îranî ye, bike yek. Ji ber vê yekê, du astengî li pêşiya beşdarbûna jinên Kurd hene. Piraniya demê, tekoşîn ji aliyê mêran ve hatiye lidarxistin.

Lêbelê, van astengiyan rê li ber jinan negirtiye ku bi vî rengî têbikoşin. Di dema Komara Kurdistanê de, jinên Kurd di têkoşîna neteweyî de gelek berî wê rolek lîstin. Her du mehan piştî damezrandina hikûmeta Kurdî, Pêşewa Qazî Mihemed Yekîtiya Jinên Demokrat a Kurdistanê damezrand. Ew bi tevahî li ser bingeha Komarê bû û di xizmeta doza neteweyî de bû.

Lêbelê, ew destpêkek û hewldanek girîng bû ku Pêşewa karibû, jinan bi fermî bîne qada xebata siyasî û medenî, ku ev yek hişê vekirî yê têkoşîna neteweyî ya Kurd nîşan dide ku jinan weke beşek ji vê têkoşînê dibîne û ji bo wê gavan diavêje.

Ji wê demê ve, jinan ev têkoşîn kêmzêde berdewam kirine, lê tiştê balkêş pênaseya rast a beşdariya jinan di vê têkoşînê de ye. Eger em li rêjeya beşdariya jinan di partiyên siyasî de binêrin, Hejmara wan ji ya mêran pir kêmtir e, ku bandorek neyînî li ser pêşveçûna jinan û pêşveçûna ramana neteweperwer dike ji ber ku jin ne tenê beşek ji vê têkoşînê ne, lê di heman demê de perwerdekar û dibistanên zarokên Kurd in.
Ji ber vê yekê, divê partiyên rojhilat li ser vê mijarê û hebûna jinan di organên partî û astên biryardanê de micidtir bixebitin ji ber ku pîvana gihîştina wan beşdarbûna jinan a zêdetir e.
Eger em li dîroka têkoşîna xwe vegerin, em dibînin ku jinên Kurd di hemû qonaxên têkoşînê de roleke baş lîstine. Beşdarbûna têkoşînê ne tenê hilgirtina çekan e.
Jin di hin waran de roleke mezintir ji mêran dilîsin û divê hemû pîvan di nirxandinan de werin berçavgirtin. Di dawiyê de, ev hemû cûreyên têkoşînê ye ku me gihandiye vê qonaxê.

Tiştên ku di serhildana Jînayê de qewimîn bingeha nîqaşê ne û van îdiayan îspat dikin. Derketina holê ya vê şoreşê têkoşîna bênavber a gel e, bi taybetî jinên li Rojhilatê Kurdistanê, yên ku bêçek lê parêzvanên jîngehê bûn.
Ew mamostayên zimanê Kurdî, helbestvan û çalakvanên serbixwe bûn. Ev hemû xizmet û raman ji bo pêşxistina ramana neteweperwer a Kurdî bûn û berhema şoreşa mezin bûn ku jin û mêr mil bi mil hevdû beşdarî wê bûn.
Mînaka dawî helwesta Sirwe Pûrmihemedî û Zara Mihemedî bû, ku ji ber axaftina bi zimanê xwe ya dayikê pênc sal cezayê girtîgehê lê hat birîn. Wê got, “Em beşek ji têkoşîna 100 salî ya rizgariya Kurd û Kurdistanê ne.”
Derdikeve ku çawa em berdewam bûn, helwestên berê yên Sirewe, Zara, Mujigan Kavûsî û gelek çalakvanên jin ên din ku ji bo rayedarên Îranê bûne tirs, ji me re dibêjin ku jinên Kurd rêyek nû ya têkoşînê hilbijartine ku hêjayî bihêzkirinê ye.

Tişta ku ez dixwazim bêjim ev e ku jinan li Rojhilatê Kurdistanê dev ji rexneyên xwe yên li ser neteweperestiya Kurdî bernedane û li ser vê baweriyê ne ku ew beşek ji vê têkoşîna ji bo çareseriya rast in.

Wan mekanîzmayeke nû, têkoşîna nû ji bo hevgirtina neteweperwerî û femînîzmê pejirandiye, ji ber ku ew li ser vê baweriyê ne ku bidestxistina azadî û serweriyê ne bidestxistina hemû mafên jinan e, belku tenê rê xweş dike bo berdewamkirina xebata femînîstî, ji ber vê yekê ku, di vê qonaxa rizgariyê de, jinan mekanîzmayek bi dest xistine ku her du têkoşînan bi awayekî pratîkî ve girêbide, ku hem dikare bibe beşek çalak a tevgerê û hem jî têkoşîna jinan ji bo mafên wan, bi berçavgirtina rewşa siyasî û medenî a li rojhilat, pêş bixe.

Ev têkoşîn bi reng û bêhna xwe ya Kurdewarî û neteweyî îspat dike ku têkoşîna femînîst û têkoşîna neteweyî ti nakokî nînin û dikarin hevdu temam bikin û piştgirî bidin hev.
Tişta herî girîng niha ew e ku meriv ramana hebûna gotareke zelal a jinan ji bo niha û pêşeroja jinan pêş bixe.

## Nerîna



**“Mesrûr Barzanî”:**

**“Hikûmeta Herêma Kurdistanê dost û hevalbendeke cihê baweriyê ya Amerîkayê ye”**



**“Rêber Ehmed”:**

**“Rêkeftinên li Amerîkayê belge ne ku Kurdistanê cihê baweriya dostên xwe ye”**



**“Israel Katz ”:**

**“Ez ê serê Êxtaposa Komara Îslamî jê bikim”**




**“Mark Rutte” :**

**“Biryara Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) ya xwefesixkirin û çekdanînê “bipêşketineke girîng e”**

# Keça Kurdistanê ji nav girtîgehê dibêje emê di xebata xwe de berdewam bin



**N. Eskender Ceiferî**



Sirwe Pûrmihemedî ku niha li girtîgeha Sinê de ye, di hevpeyvîna xwe ya di riya têlêfonê re bi malbatê û bi hevalan re dibêje wêrekiya xwe zêde bikin, Xebat didome.

Sirwe Pûrmihemedî mamosteyeke Kurd e ku di serhildana Jînayê de hate girtin û niha li nav girtîgehên dagirkariya Îranê de dibêje: “Li Kurdistanê têkoşîna azadiyê li dijî dagirkariyê wê berdewam bike”

Wê çalakvana Kurd li ber deriyê girtîgehê, nasnameya keça Kurdistanê yan jî kenîşkî Kurdistan wergirt. Bavê wê got Sirwe keça Kurdistanê ye lewma em serbilindin.

Sibeha 19ê Nîsana 2025an, Sirwe Pûrmihemedî, çalakvana Kurd û mamosteya zimanê Kurdî ku 36 salî ye, bi serbilindî xatirê xwe ji malbat û hevalên xwe xwest. Çend xulekan şûnda, wê dest bi kêşana sizayê xwe yê pênc salan li girtîgeha jinan a bajarê Sinê li Rojhilatê Kurdistanê kir.

Sedemên biryara dadgehê ev in: xebat ji bo parastina zimanê Kurdî, parastina nasname û daxwaza maf û azadiyan ji bo Kurd û Kurdistanê.

Pûrmihemedî berî girtina xwe jî peyamek ji rêjîma dagirkar a Îranê re şand. Bi gotinên helbestvanê navdar ê Kurd Şêrko Bêkes, wê dest pê kir û got: “Tenê tiştê ku hûnê qet bi dest nexin ev e ku hûn azadiyê ji ruh û canê me paqij bikin.

Hûn dikarin laşên me bigirin, lê qet azadiya di nava rih û canê me de nikarin ji me bistînin.” Wê bi eşkereyî pabendbûna xwe bi rêbaz û têkoşîne re ji nû ve dupat kir û got: Dema ku min piştgiriya malbat, hevalên xwe û netewa Kurd hest pê kir, min zanibû ku ez li cîhekî rast rawestiya me. Heya nefesa xwe ya dawî, ezê têkoşîna xwe bidomînim.

Sirwe Pûrmihemedî mamosteya zimanê Kurdî ye li komeleya çandî ya Nojîn, ku ji bo parastin û pêşvebirina çand û zimanê Kurdî dixebite. Ew bi awayekî çalak beşdarî tevgera “Jînayê” bû - serhildana ku piştî şehîdkirina Jîna Emînî di payîza 2022an de li Kurdistanê li dijî dagirkarên Îranê dest pê kir û ji hingê ve bûye hêmaya berxwedanê li dijî rêjîma Îranê, bi taybetî li Kurdistanê.

Endamên Nojîn xwe wekî beşek ji têkoşîneke rizgariyê ya demdirêj dibînin û dibêjin: “Ev şoreş berdewamiya berxwedana zêdetirî sed salî ya li dijî kolonyalîzmê li Kurdistanê ye. Komeleya me jî beşek ji vê çarçoveyê ye.”

Girtina wê ya cara yekem di roja 29ê Çileya 2023an de pêk hat, dema ku Sirwe Pûrmihemedî ji bo wergirtina agahdariyan li ser dosyeyên endamên girtî yên komeleya Nojîn serdana dadgeha rêjîma dagirkar a Îranê li bajarê Sinê kir, Tevî ku wê demê ti sûcdariyek li dadgeha dagirkar li dijî Sirwe tunebû jî, lê ew heman rojê li wir hate girtin.

Sirwe wê demê du heftiyan di bin çavdêriya ewlehiyê de û di bin lêpirsînê de ma. Piştre heya dema standina biryara dadgehê bi danîna barimteyê hate berdan.

Di roja 25ê Mijdara 2024an de, dadgehê bi tawana avakirina komekê bi armanca têkdana ewlehiya Îranê, pênc sal sizayê girtîgehê bo wê bi, Wisa dixuye ku tomet li ser bingeha pabendbûna wê bi zimanê Kurdî û perwerdehiya siyasî ye. Endamên din ên komeleya Nojîn jî berî Sirwe, di çarçoveya tevgera “Jînayê” de hatibûn girtin.

Berteka malbata wê jî bi qasî ya çalakvanên din ên hevalên wê tund bû. Bavê wê got: “Keça min ne ji ber kirina sûcekî tê sizakirin, belku ji ber zimanê Kurdî xebat kiriye rastî sizayê tê. Ew ne tenê keça min e - ew keça Kurdistanê ye. Ez pê serbilind im.” Dayika wê jî got: “Ewê dê bi rûmet biçe girtîgehê. Ez hêvî dikim ku ew roj were ku ew kesên ku îro zarokên me siza dikin li ber dadgeha me bisekinin.”

Ji bo Sirwe Pûrmihemedî, girtîgeh ne têkçûn e, lê belê beşek ji rê û xebata wê ya siyasî ye. Ew dibêje: “Ev biryar, bêhêziya kolonyalîzma Îranî nîşan didin - û ew nîşan didin ku civaka Kurdistanê zindî ye. Piştî cejna mezin a Newrozê, ku îsal li hemû bajarên Kurdistanê hate pîrozkirin, rêjîmê bi zext û zordariya zêdetir bersiv da. Lê em netirsin.”

Doza wê ji bo gelek çalakvanên di tevgera azadiya Kurdistanê de ku ji bo mafên mirovan, diyarkirina çarenûsa siyasî, azadî û rizgariya Kurdistanê, azadiya çandî û beşdariya siyasî di gorrepanê de ne, mînakeke mezin e. Tevgera “Jînayê” ne tenê guhertinên siyasî, lê di heman demê de guhertinên çandî jî dane destpêkirin. Sirwe Pûrmihemedî bi awayekî zelal dibêje: “Girtîgeh tenê qonaxek din a berxwedanê ye. Ezê xebata xwe berdewam bikim heya ku Kurdistan azad bibe.”



# Divê destberdarî rawestin



N. Ebdûlazîz Qasim



Tevlî rewşa aborî û siyasî û leşkerî ya lawaz di Sûriyê de, her ji destpêka helweşandina rêjîma Be'is di 8ê çileya yekem 2024an de û heta roja îro, bi hatina Ehmed Elşerih yê di nav lîsteya terorê de li ser desthilata Sûriyê, ku dihat pêşbînîkirin ku Tevgera siyasî û leşkerî ya li Rojavayê Kurdistinê karibe mafên Gelê Kurd yên neteweyî misoger bike, lê mixabin ne ji hêla Rêveberiya Xweseriya PYDê û ne jî ji hêla ENKSê ve hîç destkeftek neteweyî bo Gelê Kurd nehate bidestxistin, berovajî ku desthilata Sûriyê ya demkî bi rêya çend rêkeftinên takalî ligel HSD, karî hêza xwe ya leşkerî zal bike li ser çend deverên stratîjî li Rojavayê Çemê Ferat wekî taxên kurdan li Helebê, Minbic û Tilre'fet heta li vê dawiyê radestkirina Bendeva Tişirînê û çend kargehên petrolê li Dêrazorê, zêdebarî ku desthilata Sûriyê ya nû mikure li ser heman siyaset û zihniyeta rêjîma Be'is ya dijî Gelê Kurd.

Dûrxistina hemwelatiyên kurd ji dezgehên fermî û hikumraniya Sûriyê û dabeşkirina post û pileyên bilind li ser hemwelatiyên E`reb û tevlî destnîşankirina hindek tawanbarên mafên mirov yên dest heyî di komkujiyan de, wekî tawanbar Ebû Emeşa yê tawanbar bi pêkanîna çendîn komkujiyên dirinde yên dijemirov li Efrînê û tawanbar Ehmed Îhsan Feyad el-Xeys, ku bi nasnavê "Ebû Hatem Şeqra" tê naskirin, ku ji hêla wezareta bergiriya Sûrî ve wekî fermandarê Firqeya 86an li parêzgehên Hisiçe û Dêrazorê û Reqayê hate destnîşankirin û tevî ku ji sala 2021an ve di nav lîsteya sizayên Amerîkî de ye, herwiha ku ji hêla Washingtonê ve wekî "binpêkirinên mafên mirovan yên giran û sîstematîk" hatiye gunrhbarkirin, bi taybetî ku li ser destê wî siyasetmedara Kurd Hevrîn Xelef û hevala wê li ser rêya navneteweyî ya M4 li nêzîkî Serêkaniyê di Cotmeha 2019an de hatibûn kuştin.

Ji kiryar û herwiha daxuyaniyên fermî yên vê hikumeta demkî xuya dibe ku wê berdewam be li ser înkarkirina mafên neteweyî yên Gelê Kurd, bi taybetî ku dijberiya mafên neteweyî yên Gelê Kurd ji aliyê dewletên dagîrker yên Kurdistanê ve tê piyadekirin, naxasim ku hikumeta demkî ya Sûriyê niha bi timamî ji aliyê Tirkiyê ve tê bi rêvebirin yan piştevanîkirin.

Li vê dawiyê hevdîtina Serokê Frnsayê ligel Elşerih û herwiha hevdîtina Serokê Amerîka Doland Trump ligel wî li Erebistana Sûdiyê û daxuyaniya Trump bi rakirina sizayan li ser hikumeta Elşerih, bê ku hîç hesabek yan berçavgirtinek ji mafên mirov û demokrasiyê bihête girtin.

Helbet ev yek dê bibe hander ku ev hikumet ne tenê berdewam be li ser redkirina mafên neteweyî yên Gelê Kurd û herwiha dibe ku di demek nêzîk de komkujiyan jî li dijî Kurdan pêk bîne, wekî heman komkujiyên li Efrînê û herwiha yên li dijî Elewiyan û Durziyan, nemaze ku îro danûstandinên cidî di navbera vê hikumetê û Israel de dibin.

Îro di vê rewşa niha de û li gorî nêrîna min ku di pêşiyê de divê rê li pêş destberdariyên HSD bo hikumeta demkî bêne girtin, û divê xalên konfransê Qamişlo yê 26ê Nîsanê bi zûtirîn dem li ser erdê bêne cêbicêkirin û aktîvkirin, tevî ku pêwîstiyek mezin bi hemahengiyê di navbera Kurd û Durzî û Elewiyan de heye, herwiha divê hevdîtin ligel wan bêne lidarxistin.

Xala dîtir ya herî giring bi nêrîna min; divê raydarên dewleta Îsrael bêne dîtin û têkilî ligel Israel bêne pêkanîn û asayîkirin, ku her rêkeftineke Israel ligel Şamê ne li ser hesabê mafên Kurd be, di baweriya min de ku gelek berjewendiyên hevbeş di navbera kurd û Israel de hene û pêwîstiya Isreal jî bi kurdan heye.



# MIJAR: HEVKARÎ, TIFAQ Û YEKITÎ





N. Cano AMEDÎ

**Beşa 1**

Ji mêj ve ye mijara yekîtî, tifaq, hevkarî, xebatên hevbeş, têkoşîneke milî û avakirina enîyeke sîyasî bingeha gengeşî û rexneyan e. Ev mijar li hemû beşên Kurdistanê problemek bingehîn û sereke ye. Di heman deman de vê mijara hanê her rojeva sîyasî dagir kirîye.

Pirî caran şert û mercên pêvajoyê, daxwazên raya giştî û pêwîstîyên têkoşînê, wêneyên cuda radixe ber çavan. Bersîv û daxwazên sîyasî yên rastaqîn di bin bandora hêz û berjewendîyên teng de asê dimîne; mijar û pêwîstîyên têkoşînê di nav tevlîhevîyek bê pîvan de hunda dibe.

Heqî û neheqî tevlihev dibe; rexne û sitemkarî ji armancên xwe dûr dikevin. Dijberîyek bê aso, di kûrahîya salên derbasbûyî de li ser bingeha tolhildanê deng vedide. Ev dêrûnîya hanê neqebên asê derdixe holê û rê li ber dîyalogên çêker digire!

Di demsalên "normalîzasyonê" de, di dema "pêşketin" an "biharên sîyasî" de, şirîk û xwedîyên serkeftinan gelek in; lê di dema têkçûn û zivistanên sîyasî de "pêvajoyên birîndar" bêxwedî û sêwî ne! Di wan demsalan de paleyên gilî û gazinan zede dibin, Bi rexneyên nedicîh de agir bera daristanê didin, ter û hişkan bi hevra dişewitînin!

Gava em rastîya xwe û welatê xwe baş analiz nekin, nexweşî û pirsgirekên xwe bi nav nekin, em li teşhis û tedawîyan negerin, wê rewşa me her ku biçe xirabtir bibe.

Ji ber wê yekê pêwîstîya me, bi hewldanên rasteqîn, bi hûqûq û armancên hevbeş heye. Ji bo peyderkirina rêgehên çareserîyê, ji bo bersîvên berhemdar û rasteqîn divê em goh bidin rexneyên çêkier, ji wan sûd bigirin! Di rêgeha çareserîyê de pêwîstîya me bi pirs û bersîvên muşterek heye.

Gelo ji bo çi, di nav tevgerên kurdî de yekîtî, hevkarî çênabe? Çima û ji ber kîjan sedeman e ku em nikarin xwe ji gerînoka 50 salên dawîyê xilas bikin? Ji bo çi, em nikarin xwe ji demsalên kêmasî û şaşîyan azad bikin? Gelo ew kîjan hêz û faktorin ku sîyaseta Kurdistanî dîl girtîye? Ew çi sedem û demsal in ku bandora "qeyûman" ji ser sîyaseta Kurdî ranabe? Çima alternatîfên çareserîyê peyda nabin? Çima dêrûnî û sosyolojîya îdeolojîk piştî ewqas ders, tecrube û pêvajoyên girîng, hê jî li taxên sîyasî desthilatdar e? Çima em nikarin xwe ji bin bandora sîyaseta barkirî, ji bin bandor û desthilatdarîya "komser" û "abê"yan azad bikin?

Gelo berjewendîyên grûbî yan şexsî ne, yan jî karekterê murîdîyê ye dibe asteng? Ew çi egoye ku her tim rê li ber birq û brûskan xweş dike? Çima îdeolojîyên tundrew û hesabên biçûk li taxên sîyasî xwedî bandor in? Divê herkes neynikê deyne ber xwe û ji xwe bipirse, li ser bersîvên xwe biponije. Ev bixwe helwestek mirovahî, ûjdanî û hûqûqî ye.

Em hemû baş zanin ku ev pirsên hanê pir girîngin û bersiv jî ne hêsan in. Dabeşkirin û sîstema dagirkerîyê rê li ber me asê kirîye. Lêgerîn û rêya çareserîyê her tim di quncikên tarî û di nav gotegotên vala de hatîye fetisandin. Sedemên ku di nav tevgerên kurdan de hewldanên bi hevra kar kirinê, karên hevbeş, yekîtî û xebatên hevkarîyê çima bi ser neketîye gelek in û xwedî bingehek dîrokî, siyasî û civakî ne. Divê em careke din bi hûrgulî bal bikşînin ser vê mijarê.

Em hemû baş dizanin ku dîroka parçebûn welatê me û hewldanên çareserîyê bi hevre girêdaye. Kurdistan di nav çar dewletan de hatîye parçekirin. Ev parçebûn li her parçeyekî bûye sedema cudabûna di armanc, stratejî û bernameyên tevgerên kurdî de. Her parçeyek di bin bandora rejîmek dagirker de dîl maye û ev realite jî bandorek negatif li ser organîzebûn û têkoşîna netewî kiriye û bûye gêrînoka pirsgirêkan!

Dîsa em dizanin ku tevgerên kurd xwedî îdeolojiyên cuda ne. Hin ji wan demokrat û neteweperwer in, hinek jê xwedî nêrînên sosyalîst in, hin jê jî xwedî ajandeyên îslamî ne. Ev cudahîyên îdeolojîk carinan dibe sedema nakokî û nepejirandina xebatên hevbeş. Berjewedîyên grûbî an partîperestî dibe sedama pêşbazî û nakokîyên îdeolojîk.

Hinek alî jî sîyaseta xwe li gorî çarçovaya berjewendîyên rêxistînî û sînorkirina dewleta ku lê dijîn tayin dikin. Sîyaseta xwe li ser bingeha demokratîkbûn û demokrasîya dagirkerîyê dizayn dikin. sîyaseta milî berjewendîyên netewî, tune hesab dikin. Ev jî tesîrek giran li ser têkoşîna netewî dike.

Sed sal zêdetire dewletên dagirker û nizama li dijî milletê Kurd bi siyaseta klasik ya "parçe bike û bi rêve bibe" paradigmayek amade kirine û li ser tevgerên kurd dimeşînin. Ew dikarin piştgiriyê bidin aliyekî kurd li dijî aliyekî din, ku ev yek dibe sedema kûrkirina nakokiyan di navbera wan de. Ji ber ku hişmendîya milî ne desthilatdare û nakokîyên di navbera partîyan rê li ber têkoşînek hevbeş digire û rê li ber pirsgirêkên nû vedike. Ev nakokîyên bêbingeh dibe sedema parçebûnê û kêmbûna hewldan û xebatên hevkariyê. Pirî caran têgihiştinên cuda dikare rê li ber yekrêzî û xebatên hevbeş bigire.

Lê belê, em dizanin ji ber gelek sedeman ev hewldanên hanê bi ser neketine, demkî mane û berdewamîyek berhemdar li pey xwe nehiştine. Ev jî dide xuya kirin ku di warê hevkarî, tifaq, yekrêzî û xebatên hevbeş de em ne xwedî têgihiştinek milî û hişmendîya armancên hevbeş in. Perçebûn û dabeşkirina welatê me bandora xwe bi şêweyek negatif li ser tevgerên Kurdî kirîye.

Ligel van hemû sedeman jî, di dîroka me ya nêzîk de gelek hewlên tifaq û yekbûnê çêbûne û di hin serdeman de xebatên hevkarî û hewldanên girîng pêk hatîye. Li gel hemî hewldanên xernexwazên dijberên milletê kurd, dîsa jî doza azadîya Kurdistanê bi hemû amûrên têkoşînê domandîye û didome. Dîsa ji bo yekrêzî û hevkarîya nav mala Kurdî gavên girîng hatine avêtin û nimûneyên pozîtîf jî hene ev jî cîhê kêfxweşîyê ye. Her diçe ev hişmendî zêdetir dibe û hêvîyan xurtir dike.

# Ji bo lêxwedîderketina zimanê kurdî, berîya her tiştî divê em bi kurdî biaxivin, em kurdî fêr bibin



**N. Mistafa Ozçelîk,**
**Serokê Giştî yê**
**Partîya Welatparêzên**
**Kurdistanê (PWK)**

Ji bo lêxwedîderketina zimanê kurdî, berîya her tiştî divê em bi kurdî biaxivin, em kurdî fêr bibin

Celadet Bedirxan û hevalên xwe di 15ê Gulana 1932an da hejmara yekem a Kovara HAWARê derxistin û heta 1943yan 57 hejmarê HAWARê derketin.

Girîngîya Kovara HAWARê, ewe ku, yekemîn kovara kurdî ye ku bi tîpên latînî hatîye weşandin.

Ji ber vê yekê, 15ê Gulanê, ji alîyê hinekan ve wek ‘’Cejna Zimanê Kurdî’’, ji alîyê hinekan ve jî wek ‘’Roja Zimanê Kurdî’’ tê pîroz kirin.

Em Celadet Bedirxan û hevalên wî bi rêzdarî bi bîr tînin û spasîya wan dikin.

Belê, roja 15ê gulanê jî di nav de, ji bo zimanê kurdî ( kurmancî, kirdkî/ zazakî) gelek çalakîyên cûr bi cûr têne li dar xistin, xebat têne kirin.

Helbete ku hemû çalakî û xebatên ji bo zimanê kurdî girîng in, pîroz in û divê em piştgirîya wan bikin.

Lê bi ya min, li gel van xebat û çalakîyan, nuha ji bo zimanê kurdî berîya her tiştî divê em van çar tiştên esasî bicîh bînin.

Yekem: Her kurdekî ku bi kurdî nizane, divê kurdî fêr bibe. Her malbateke kurdan divê zarokên xwe fêrî kurdî bikin; divê di nav mala xwe û di her beşên jîyanê de zimanê me yê esasî kurdî be, em bi kurdî biaxivin.

Duyem: Bi qasî vê gava yekem, tiştekî din yê girîng jî heye ku, mixabin gelek alî û kes paşguh dikin. Ew jî dersa bijarte ya kurdî ye. Ji alîyekî ve malbatên kurd bi hêjmareke gelekî kêm ji bo zarokên xwe serî li dersa bijarte ya kurdî didin.

Ji alîyekî jî wek ku dewlet ji dersa bijarte ya kurdî jovan bûbe, astengîyan derdixe, gelekî kêm mamosteyan tayîn dike. Ji ber vê rastîyê, divê em awayekî cidî li ser vê mijarê rawestin.

Divê em bikaribin her sal 200.000 zarokên kurdan li dersa bijarte ya kurdî qeyd bikin û her ku here zêdetir




bikin. Ji bo 200.000 hezar zarokan dê herî kêm pêwîstî bi 2000 mamoste û bi milyonan pirtûkên dersê hebin. Ma gelo ev tu heyecanê nade we?

Ev herdu gav, dê rêya bidestxistina mafê perwerdeya bi kurdî û fermîbûna zimanê kurdî xweştir û xurtir bikin.

Sêyem: Divê xebateke berfireh bê meşandin da ku zimanê kurdî bibe zimanê fermî û perwerdeya bi zimanê kurdî bê qebûl kirin û di qanûna bingehîn û hemû yasayên peywendîdar de ev maf bêne garantî kirin.

Çarem: Divê hemû şaredarîyên li Kurdistanê li gel tirkî, kurdî (kurmancî, kirdkî/zazakî) wek zimanê fermî yê şaredarîyê bikar bînin. Kreşên zarokan ên bi kurdî û dibistanên bi kurdî vekin.Hemû partiyên sîyasî, dezgehên sivîl û meslekî yên li Kurdistanê jî ji bo bicîh anîna axaftin û fêrbûna zimanê Kurdî, divê seferber bibin da ku amûr û îmkanên pêwîst bêne ava kirin.

Belê, ev çar gav, dê sîstema asîmîlasyonê bi awayekî bihêz bihejînîn, dê rê vekin da ku bi milyonan kurdên ku bi kurdî nizanin bikaribin bi kurdî biaxivin, kurdî fêr bibin.

Kurdî hebûna miletê kurd e, heykelê netewetîya me ye. Ji bo ku em bikaribin rê li ber zext û asîmîlasyona li ser kurdî bigrin, werin em ji pêkanîna van her çar gavan destpê bikin.

# PWKyê Li Amedê Ji Bo Roja Zimanê Kurdî Semînerek Li Dar Xist



Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK) bi minasebeta Roja Zimanê Kurdî, roja 15.05.2025ê, li Amedê semînerek li dar xist.

Berdevkê PWKyê Hanîfî Tûran moderatorîya semînerê birêvebir.

Di destpêkê de Hanîfî Tûran bixêrhatina beşdaran kir û ji bo hemû şehîdên Kurdistanê rêz hate girtin.

Hanîfî Tûran di derbarê Roja Zimanê Kurdî de kurte axaftinek kir.

Cîhgirê Serokê Giştî yê PWKyê Mehmet Can Azbay daxuyanîya PWKyê ya di derbarê Roja Zimanê Kurdî de xwend û paşê di derbarê Kovara Hawarê, rola Bedirxanîyan û di hûnandina heykelê miletbûnê de girîngîya zimanê kurdî de semînerek da.

Li gel rêvebir û endamên PWKyê, Serokê ŞIVÎDERê Azîz Ozalp û gelek sîyasetmedar û rewşenbîrên kurd beşdarî semînerê bûn.

Piştî semînera M.Can Azbay, sîyasetmedar û rewşenbîrên kurd îbrahîm Guçlu, Şêxmûs Dîp, Osman Karavîl, Mehmet Ekîncî, Ferhat Boskan jî di derbarê girîngîya lêxwedîderketina zimanê kurdî û têkoşîna ji bo fermîbûn û perwerdeya bi zimanê kurdî de bîr û reayên xwe anîn zimên.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjîma Îranê 2 bira li bajarê Bokanê de binçav kirin



Li bajarê Bokanê de 2 bira yên xelkê wî bajarî, ji aliyê hêzên hov ên îtilaata rêjîmê ve hatine girtin û bo ciheke nexuya hatine veguhastin.
Pêka raporên belavbûyî, roja Pêncşemî 15ê Gulanê, hêzên îtilaata rêjîmê li bajarê Bokanê, bi awayê xoserane, êrîş kirine ser cihê karê welatiyekî Kurd ê xelkê bajarê Bokanê yê bi navê "Ezîz Ebdullazade" û bê belgeya yasayî, ew binçav kirin û bo ciheke nexuya veguhastin.
Hevdem, hêzên îtilaata rêjîmê bi rêye pêwendiya têlêfonî, birayê "Ezîz Ebdullazade" yê bi navê "Omîd Ebdullazade" bo îdareya îtilaata rêjîmê li bajarê Bokanê gazî kirin û li wir de hatiye girtin û bo ciheke nexuya, hatiye veguhastine.
Heta niha sedema binçavkirin, tohmetên sepandî bi ser wan 2 birayan û cihê ragirtina wan, nehatiye zanîn.
Rêjîma Îranê li proseyeke demdirêj de ji çendîn heyvan berî niha ve li Rojhilatê Kurdistanê, dest avêtiye binçavkirina welatiyên Kurd û bi awayê xoserane û bê belgeya yasayî, êrîşê dike ser malên welatiyan, çalakvanên "medenî, sendîkayî, jîngehparêz" û xwendekaran û bi awayê hovane wan bi tundûtîjiyê binçav dike ku ew girtiyane li îşkencegehên rêjîmê de rastî hovanetirîn îşkenceyên fîzîkî û hundîrî tên û li dadigehên şanoyî de bi tohmetên wehmî û çewt, hinek car sizayên giran bi ser wan de disepînîn.

## Kiryarên hovaneyên rêîmê li Belûçistanê, berdewam in



Li êrîşa hovaneya hêzên rêjîmê bo ser gundê "Rehmetabad"ê ser bi bajarê Xaşê, çendîn kes hatine binçavkirin ku nasnameya 5 kes ji wan hatiye belavkirin, herwisa rêjîmê zarokekî temen 14 salî bi awayê xoserane û bi tundûtîjiyê, binçav kirine.
Pêka rapora "Halveş"ê, li êrîşa hovaneya rêjîmê bo ser malbatek Belûç li gundê "Rehmetabad"ê ser bi bajarê Xaşê 7 kes hatibûne girtin ku 5 kes ên bi navên, "Zahid Bolanzêhî, temen 32 salî kurê Mîlxan, Ziya Bolakzêhî temen 38 salî kurê Mihemedriza, Erdeşîr Bolakzêhî temen 30 salî kurê Kehûr, Emînullah Mîrbelûçzêhî temen 31 salî kurê Yedullah û Melik Bolanzêhî" ên xelkê gundê "Temp Rîgan"ê ser bi bajarê Îranşehrê û gundê "Rehmetabad"ê ser bi bajarê Xaşê, li girtîgeha rêjîmê de hatine ragirtin.
Ew kesane li êrîşa xoseraneya hêzên îtilaata rêjîmê de hatine girtin ku yek ji wan xwediyê malê û yek jî kurê wî ye.
Herwisa roja Çarşemî 14ê Gulana 2025 an, zarokekî temen 14 salî yê bi navê "Salih Behramzêhî", kurê Mewlewî Ebdulrehman li dema lîstin digel hevalên xwe li gundê "Nesîrabad"ê ser bi bajarê "Serbaz"ê, ji aliyê hêzên îtilaata rêjîmê ve bi tundûtîjî û bê belgeya yasayî, li nav zarokên hevalên wî de bi lêdan û kutanê, hate binçavkirine û li sendûqa pişta maşînê de bo ciheke nexuya hate veguhastin.
Pêştir mam û birayê wê zarokî, ji aliyê rêjîmê ve hatine kuştin û qedera wî zarokî jî, nerohn e.

## Bidarvekirina girtiyan li girtîgehên rêjîmê de berdewam e



Pêka rapora "Hengaw"ê, sibêdeha roja Duşemî 22ê Banemerê, "Mihemed Ebdî welatiyê Lor ê xelkê Erakê , Nêimet Pîrzalî xelkê bajarê Dilfanê û Celîl Ezîzî" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Erakê de hatine bidarvekirin, ew welatiyane bi tohmetên pêwendîdar bi madên hişber, ji aliyê dadgehên rêjîmê ve sizaya bidarvekirinê bi ser wan de hatibû sepandin.
Herwisa "Resûl Rizayî, û Eşref Şehzbazî" ku pêştir ji aliyê dadgehên rêjîmê ve bi tohmetên pêwendîdar bi madên hişber sizaya bidarvekirinê bi ser wan de hatibû sepandin li 17ê Banemerê, li girtîgeha rêjîmê li bajarê "Yasûc"ê de bidar vekirin.
Li berdewamiya bidarvekirina girtiyan li girtêgehên rêjîma , 2 girtiyên din ên Kurd li girtîgehên rêjîmê li bajarên "Kerecê û Urmiyê", de hatine bidarvekirin.
Pêka rapora "Kurdpayê, sibêdeha roja Çarşemî 24ê Banemera 1404 a Rojî, girtiyek bi navê "Moşîr Osmanzade" kurê "Tahir" ê naskirî bi(Ferîq) ê xelkê bajarê Urmiyê ku 4 salan berî niha bi tohmeta kuştina bizanebûn ji aliyê dadgeha rêjîmê ve sizaya bidarvekirinê bi ser de hatibû sepandin, li girtîgeha rêjîmê li bajarê Urmiyê de hate bidarvekrin.
Herwisa li vê rojê de girtiyek Kurd ê bi navê "Riza Mîrî" kurê "Mihemed Mîrî" ê xelkê bajarê "Hêrsîn"ê ser bi parêzgeha Kirmaşanê ku pêştir bi tohmetên pêwendîdar bi madên hişber ji aliyê bdadgeha rêjîmê ve sizaya bidarvekirinê bi ser de hatibû sepandin, li girtîgeha Qizilhisar a rêjîmê li bajarê Kerecê de hate bidarvekirin.

# Agirî


◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdiśtanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (494)


